



# ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha Çand û Ragihandina Encûmena nîştîmanî kurdî

**Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje**

**Sernivîser-Yusra Zibêr**

**Lêvegera Ziman- Mihemed Kose**

**Desteya birêvebir**

**Ferhad Şêxo**

**Hemdiya mele**

**Mihemed Kose**

**Ji bo têkiliyên We bi Me re**

**Li ser Amêlê**


**[Rojname .enks@gmail.com](mailto:Rojname.enks@gmail.com)**

**Jmar 9**

## Pêşgotin

### Nêzîkbûna bê Bingeh

Ji bal çen Aliyan Gef bi ser Kurdistanana Sûriyê de tên û Metirsyek rastî li ser Parastin û Hebûn Miletê Kurd li ser Xaka wî Dîrokî ve şêwazdikin , ji Rexekîve Rijêm Paş çend Serkeftinên Serbazî her çend Demekî û Demekî tekesdike ku vegere Kurdistanana Sûriyê heger bi Aştî be yan bi Şer be wek ku Welîd al Mû,elim Şahiryarê Derevey Rijêmê amajekir. Ji Rexekî dîve Artêşa Turk Niyaza xwe na veşêre ku dixwaze derbasî Deverên mayî ji Bajar û Gundên Kurdan li Rojhilata Çemê Fûratê bi alîkariya Hêzên biser Lêşkerê Azadve ê ku bi biryare Xwedanê xwe yê Turk birêve diçin û hewildana dúbarkirna Sînyaroya Efrînê bi Pêwana nehêlana Partiya Karkerên Kurdistanê. Ya siyemîn em dibînin cardî Da,îş hewldide ku Hêzên xwe yên têkçûyî bide liser hev û dûre êrîşî Devera Kurdî bike. Li hember vê Astengiya metirs li kûde di raweste ya ku binav Rêveberiya Xweser ? da ku ji xwe û ji Bajar û Gundên Kurdan dûrke Çarenûsa Kûbanê û Efrînê ya mregezad û gelo ev Baredoxa hestiyar Rewşa Cudatiya kurdî û kurdî heldigre<sup>s</sup> nexasim ku tu Berê kurd yekirtî nîne karibe Berevaniyê li Paristina li Bajar û Gundên Kurdan bike. Du Destpêşxerî hatin diyarkirin ji bal PYD darîçav dide xuyanî ku Nêzîkbûna Kudî armancdike ,ya yekemîn berdana çend Girtiyên Encûmana Kurdî Neştîmanî û li ser Lîsta wan Abdulrehman Apo , û ya duyemîn Serdana Şandeke PYD bû Kurdistanana îraqê û digel Cenabê Serok Berzanî civîn lê mexabin bê tu Guhertin di Helwêstên xwede yan Reftarên xwe bi Partiyên ne dibin Sîpera wande. Û ji bilî vena vexwendina gifûgoyek Sûrî \_Sûrî kîrn û çalakiyên wêna Roja Çarşemê di 28 ê Çira paşî destpêkîrin. Ma ya Pêwîstir ne ewbû ku wexwendina veqerana raxistina Malpata Kurd bikrane û hêzkzîkirna Zemînê li Pêş vê Gava giring wek berhevkirin jibo rûbirûkirna Metirsiyên di Rêdene bi spîkirna Zindanên PYD ji Xepatgêrin siyasî û hilandina hemî Fermanên qereqoşî ên wek Yasa Serbaziya neçar ji Xortên Kurdan re û girtina Nivîsgehên Partiyên Encûman Neştîmanî kurd û çarçevêkirna Kariyarên Serbazî bi Parastina Deverên Kurdî li Cihê ku Hezên kurdî ji hev beladibin û Qurbanî têtê dan li Deverne tu Têkiliyên Kurdan têt tune ne. Gelek Dem li Pêşiya me tune ye li Heviya Huşyarbûn Wijdan û tê xwestin bi Gavên bihûrî Rabin beriya ku Dem derbasbibe , yan çi Danûstandin PYD vexwendebike wê bimêne Danûstandina Lalan bê Sûd û bê Mefa û wê nikaribe li Hember tu Metirsiya raweste



Li gorî daxwazên gelê kurd û tevgera kurdî, û pirojeyên niştîmanî kurdî yên ku Encûmen dişopîne

## Civata Emîndariya Enksê

### Civata Emîndariya giştî ya Encûmena niştîmanî kurdî li sûriyê.

Di roja 23-11-2018an de li bajarê Qamişlo hate darxistin di lîsta kar de.baredoxên siyasî yên girêdayî, bi kiryarên Navdewletî û komîta destûrê û opsiyonê civat li ser rawestiya, hate tekezekirin hewldaneke bi hêz li mafê gelê kurd bi pêk anîn komîteke şêwirê ku piştevan be, ji nûnerên kurdan re,her weha , têkiliyên bi hemû aliyên peywendidar ji opsiyonê, û aliyên navdewletî re ji bo pêkanîna mafê gelê kurd, ji aliyekî din ve civat li ser rewşa deverê kurdî hat rawestandî û gelên dewleta turk li rojhilata firatê û metirsiya milletê me jê heye,ji ber ku tirk ta niha bida xuyanê kirin ku dijî p k k û p y dê ye,ne dijî kêşeya kurdî û milletê kurd e,di vê navê re li ser rewşa tengava Efrînê û kiryarên giropên çekdar li ser welatiyên sivîl hate tund û riswa kirin, civîn turkiya berpirsyar dibîne,di ber kiryarên wan giropan dibîne her wisa daxwaziyê ji p y dê dike ku mehna nede destê tirka ku bêtir tengavên li ser deverên kurdî bike, ji aliyekî din civatê daxwaza yakrêziyê li civata kurdî bi giştî li ser astên siyasî, civakî û rewşenbîrî li gorî daxwazên gelê kurd û tevgera kurdî, û pirojeyên niştîmanî kurdî yên ku Encûmen dişopîne, û civat li ser çalakiyên ovîsên Encûmenê hat rawestandî, ya Encşmenên xwecihî û yasayî, ragihandin,aştîya gelêrî û civakî û ovîsa jinê hate gengeşekirin û pêşingarên pêwîst hatin beryar dan, bêtir lêveger li ser beryarên berê û şêwaziyên bi cihkirina wan. Her weha nameyên hatibûn ji Encûmenê re hatin xwedin,û gengeşekirin tev de ji bo actîvîkirin û çalakiyên karûbarên Encûmena niştîmanî kurdî ya k u omîda gelê kurd e di vê qonaxa dijwar de.



**Serhan Isa**

## **Kurd û Şûreşa Sûrî Xeleka 6**

### **1- Qûnaxa rabûna cemawer a bê kontrol**

Serkêşên Şûreşê di herêmên Kurdî de Xort bûn, bê sînor û kontrol derketin kolanan û meş û çalakî li darxistin, û hêdî hêdî bi Dehan, **Hevrêzên Ciwanan** damezirandin.

Gihîşte wê radeyê ku **Hevrêzên Ciwanan** di demeke kurt de, dikarîbûn kolana Kurdî ji destê Partiyên rizgarkirin û bûn **Ojdanê Şûreşê** di

herêmên Kurdî de. Hetanî cemawerê Partiyên Siyasî jî, ji bin bandora partiyên xwe derketin û bûn beşek ji şûreşê. Dêmek baweriyek mukum li cem nifşê nuh peyda bûbû ku ev Tevgera siyasî nikare pêşengiya vê demê bike. Weku mînak dixwazim navê çend Hevrêz û saziyên ciwanan bînim ziman: 1. Hevrêza Amûdê. 2. Hevrêza Xortên serhildana Qamişlo. 3. Hevkariya xortên Kurdan. 4. Xortên Cezîrê. 5. Xortên Sewa. 6. Encumena giştî ya tevgera xortên Kurdan. 7. Yekîtiya hevrêzên xortên Kurdan. Û her weha bi dehan hevrêz û rêxistinên bi vî rengî. Dêmek di wê qûnaxa destpêkê de, hîna Tevgera Kurdî hem helwesta xwe ji Şûreşê diyar nekiribû, û hem jî tu Sîwanên yekrêziya mala Kurdî di asoyan de diyar nebû. Anku mirov dikare bêje ku ew qûnax, qûnaxa Gêncan bû. Û her mirovekî ku bixwaze dîroka Şûreşê di herêmên Kurdî de bişopîne, dikare vegere jimara xwepêşandanên kurdî, û jimara pakrewanên me.

### **2- Qûnaxa vemirandina Tevgera Xortan**

Rêcîma Tolîtar û Diktaor a Şamê gihîşte baweriyêke mukum ku wê dawiya wê li ser destê Qîz û Xortên Kurda be, ji ber vê hindê pir bi zanebûn nêzikî têkoşîna Şûreşgerî di herêmên Kurdî de bû, û pilaneke **Dualî** di herêmê de da meşandin ku ew jî ev bû:

1- Vemirandina Şûreşê di herêmên Kurdî de.

2- Jiortêhilanîna xewna Kurdî bi Azadî û Serbestiyê

û ji bo ku Rêcîm karibe vê pirojeya bi qirêj bi cî bîne, têkoşîna Şûreşvanî ji Sê aliyan ve dorpêçkir.

- I. Ji aliyê Rêcîmê ve. Li gor şopandina min ji pêvajoka Şûreşa Sûrî re, guman dikim ku Parêzgeha Hisiçe, parêzgeha Çaremîn bû ku bilez tevî refê Şûreşa Azadî û Rûmetê bû, mixabin gelek **nijadperestên Ereban** hetanî wekî vê kêlîkê jî dixwazin dîrokê berûvajî bikin û bêbextiyên bikin dema ku dibêjin xwedêgiravî Ereban agirê şûreşê di parêzgehê de pêxistin? Ez ê vê nerîna nijadperest û bêojdan ji wer e bi belgeyan derewîn derxînim. Piştî ku xortên kurdan yên di warê rêxistinî û xebatê de xwedî ezmûn û serborek rabûn ser xwe û agirê şûreşê di seranserê parêzgeha Hisiça de gur kirin, Rêcîmê Birûskname hinartin damûdezgehên xwe yên parêzgeha Hisiçe, Dêra Zorê, û Reqa yê re, û ji wan re gotin: Kurd dijminê we ne, haya we ji we hebe, û ji bîr nekin ku hun Erebin, û gereke hun Serhildana Kurdan ya 2004 an ji bîr nekin. Armanca Kurdan parçekirina welatê me ye, ew dixwazin Kurdîstaneke serbixwe û azad, haya wan qet ji Şûreşê tune ye. Her weha Xiristiyên jî tevî vê nerîna bûn. Dêmek di vir de Rêcîm li ser Du werîsan leyist, yek werîsê Tirsandina Ereban û Xiristiyanan ji Kurdan. Dido werîsê Dîmografiyeta herêmê, ku ji Sê pêkhatên netewî pêk tê, Kurd, Ereban û Xiristiyên, ku dikarîbû di riya vê pilanê re bi hesanî Bajar û Gundan Tar bi Tar têxîne bin kontrola xwe. Bêguman proje berdewam kir, rêcîmê dest bi rêxistkirina Ereban kir, ku karibin xwe bi rêxistin bikin û yek biryar bin, her weha piştgiriyeke bê hembra di warê leşkerî de bi wan re kir, û hêzên berevedanî leşkerî ji wan re ava kirin. Xaleke din pir giring heye ku çênabe Kurd jibîr bikin, ew jî ew ku Erebanê **Cezîrê** du cure ne, yek Erebanê **Xemir** yên ku deyndarê Rêcîmê ne, û dibin biryara wê de ne, Dido Erebanê din yên





- I. ku li Gund û bajaran dijîn ku ew jî bi xwe dijminên koka Kurdayetiyê ne, bêguman di nav herdu
- II. aliyan de rewşên awarte hene, anku bi wateyeke din em nikarin bêjin ku herdu Girûp 100% bi Rêcîmê re ne.
- III. Ji aliyê PYD ê ve. Şêweyê danûstandin û kargêriya Rêcîm bi Parzgehên Sûrî re ne wek hev, di her Parêzgehê de Siyasetek dida meşandin, li hinekan tûndûtûjiya leşkerî û ewlekarî û li hinekan kontrolkirin û şopandin. Ji bo ku karibe Gund û Bajarên Kurdî bi kêmtirîn ziyan tîxîne bin kontrola xwe û Şûreşê li ser astê Kurdî beravêtî bike, û xewna Kurdî têk bibe, destê xwe careke din wekî caran avête hevkar û hevpeymanê xwe yê dîrokî PKK. Ji xwe em Kurd û Cîhan jî berê dizanin ku Rêcîma Sûriya, Iran, Irak û Turkiya, ji bo kargêriya pirsê Kurdî di van welatan de, Şaneke Ewlekariya ya hevbeş avakirine. Û em dizanin jî, ku mamuste û rêberên serokê vê Rêxistinê (**Abdula Ocelan**) jî li Sûrî kî bûn. piştî 13 salan ji mêvandariyê **Hafiz Al Asad** ji **Ocelan** re, û ji bo ku welatê xwe (Sûriya) ji şerê Tirkiyayê biparêz e di meha Oktober a 1998 an de, ew ji cem xwe qewitand, û di 15.02.1999 an de, li Kîniya ji aliyê Istixbarat û Komandoyê Tirkan ve hate Dîl kirin û berê wî dane Girava Imralî. di pey re Rêcîma Sûrî dest bi girtina Kadro û xebatkarên PKK ê kirin, û bi Dehan binçav û sergon kirin, her weha xebata wan bi awayekî ne fermî li ser xaka Sûrî hate qedaxekirin. Paşê di 20.09.2003 an de Partiya Yekîtiya Demuqrat PYD ku ew jî şaxek ji şaxên PKK ê hate avakirin. Di vê kurteanalîzeyê de, em derbasî mijara PKK û PYD û hemî rêxistinên din yên bi wan ve girêdayî nabin, em ê tenê çend xalên girs ji xwendevanên bi rêz re ronî bikin, û a mayî jî em bihêlin ji şopandin û şîroveya wan re. Di hemî peyre û pirogramê vê Partiyê de, tiştê ku bi doza Kurdî û mafê wî yê netewî ve girêdayî be tune ye. Belê eger em dîroka vê partiyê bişopînin em bibînin ku ew bi xwe parçeyek ji Sîstêma Ewlekarî ya Sûrî ye. Ji ber vê yekê jî, û ji bo jiortêhilanîna pirsê Kurdî di Sûrî de, û kontrolkirina herêmên Kurdî bi sînorekî ji agir û Şikandina Şûreşê di nav Kurdan de, Rêcîmê di riya pilaneke imzekirî û offîziell re Herêm sîparte PYD. Û hemî şêweyên alîkariya Aborî, Kargêrî, Leşkerî, siyasî, Ewlekarî û Ragihandinî ji wan re pêşkêş kirin, û bi vê yêk çarenûsa Herêma û nişteciyên wê kire destê vê Rêxistina Tolîtar û Hovane, û Rêcîmê êdî hemî hêza xwe ya din berda ser parêzgehên Sûrî yên din. PYD ne tenê xwepêşindan û çalakiyên Hevrêzên ciwanan qedaxekirin, belê jiyana siyasî di sernaserê Herêmên Kurdî de rawestand. Ne tenê wisa, belê bûn Xencereke Cehiryane di kêleka şûreşa Azadî û Rûmetê de, û xwedêgiravî Şûreşek bi xwe avakirin û nav lêkirin: Şûreşa Rojava, ku ew bi xwe jî Metodek bû ji bo xapandina xelkê.
- IV. Ji aliyê Partiyên Siyasî yên Kurdî ve. Bi vemirandina Tevgera Xortan re, Şûreş jî di herêmên Kurdî de li astê cemawerî vemirî. Ev jî rastiyêke dîrokiye, divê em jê fedî nekin. Di seranserê pêvajoka têkoşîna tevgera siyasî ya Kurdî de, tu carî nikarîbû pêşengiya millet bike, mixabin her timî li şûn millet bû, her timî karê wê hêminî û vemirandin bû. Du mînakên herî berze li pêş me ne, Şûreşa 12 ê Adarê û Şûreşa Rûmet û azadiyê ya Sûrî. Piştî gelek hevîdîtin û danûstandinan di navbera partiyên siyasî yên Kurdî li Sûrî de, dikarîbûn di 26.10.2011 an de Encumena niştimanî Kurdî ava bikin. Bi avakirina ENKS ê re Helwesta Kurdî ya fermî ji Şûreşê diyar bû, û bûn parçeyekî bingeîn ji Şûreşa Azadî û Rûmetê. Lê di heman demê de jî, tevgera Xortan bi awayekî hêmin û zîrekyane vemirandin. Rol ji wan sitandin, û xebata siyasî û şûreşvanî bi xwe ve girêdan. Bêguman başî û nebaşiyên vê yekê hebûn. Ji aliyekî pir baş bû, ku dikarîbûn Gêncan ji şêlûbêlî û lîstina bi çarenûsa wan biparêzin. Û ji layekî din ve jî, nikarîbûn êdî rêvebiriya wan Gêncan bikin û hêviyên wan tertûbala kirin.

## Gelo Kurd ji Ereban bêtir dixwînin.?

.....

Moşî Deyan wiha digot: li ser Ereban , di dema cenga 1967an de di navbera Esraîl û dewletên Ereba (neksê Hizêran ,) Ji Moşî Deyan pîrsk kirin, çima hûn plana cengê aşkeredikin berî dest bi cengê dikin ? Bersîva xwe da xuyan gote . Ereba na xwînin, eger bixwînin nizanin û tiştî ji raman û plan nizanin ji ber van sedeman Ereba li zirarê û ti car bi sernakevin, û herwiha di her warekî li paşin . Gelo ka em van nimûnan daxin li serî kurdan çî li hindrî welat li rojhilata navîn, û çî kesên dijîn wek penabera li Aworpayê, û bi taybet xwendina pirtûkên bi zimanê zikmakî û Yan jî pirtûkên bi her zimanekî pê dixwînin li çar perçeyê welat, ji 20 -30 sal û virde gelek pirtûkên kurdî hat çapkirin û weşandin ji ber kes nebêje pirtûkên kurdî nîne, û bi taybet piştî cengê dewletên cîhanê dijî rijîma Îraqê û şikestina Sedam Husêin û hermêma Kurdistanê Azad pêkhat, û rewşenbîrên kurd roleke herî mezin dilîstin di warê çandî, û yeke dinjî bîrnekin kesên rewşenbîrên kurdên Yekkîtiya Sufyê perê rolek girîng di rewşa floklorê kurdî û hila çandî û wegeradina ji zimanên dî bi karhanîn . Lê gelî kurd qelsiya û lawaza dikî di warê xwendinê, tevî em û hemo dizanin gelek sedem Hene ji zardariyê û êşkence û qedexa bûna ziman ji rijîmên stemkariyên Kurdistanê , Ew dihêle roj bi roj hewlatiyên kurda ji xwendin û siyastê rkevin ji ber pîrsgirêka ji xwe re çênekin . Lê ev sedeman ne cihê pejirandinê ye, ji ber daxwaza gelî kurd serfiraziye û serxwebûna welatê xweye ewjî nayê bi çek û hêzê çekdara tistî tewrî balkêş xwendine vê wê gelî kurd Tim li zirarbin, Di cenga cîhanê diwemîn gelek dewlet û bajar bûne kavi û wêran lê dîsa rabûn serxwe bi xwendin; yek nimûnan Firansa dema serokê Firansa berleman û encûmana wezîran civat kir ji wan pîrskir gote wezîra avahiyê rewş çawaye lê vegeand gote wî rewş

nebaş û her wekî din pîrsa xwe didomand ta gihîştê wezîrê rewşbîra û xwendina dibistanê lê bersîva xwe da gote rewşa me başe hema serokê Firansa got welatê me dîsa wê avabe û bi serkeve . Ji ber van yekan kurd divê bixwînin, xwendin rêzgariya wane . Bila kurd nebêjin em li pêşin û Ereba li şûnin ev erebê pîsin û şeq loqin . Lê bila hûn zanibin ezbenî kurd ji Ereba ne baştirin di xwendinê de iro erebê şeq loq xudî dewletin xudî zimanin xudî quranin li her malekî heye, ka kurdo çî li ba te heye pirtûka ziman lê dîrok lê..... Ziman nasnameya keysîye û ol persta meye eger em li xwe bi rast venegerin roj bo roj windabibin wekî kurdên Şamê û wekî kurdên edlêb û helebê û lazqiyê û hwd. Tiştê zor û zehmet tune eger mirov bixwaze wek dibêjin şivan karê şîr ji nêriyê bidoşe (pendek Efrînê ye.)Kurdo were bi xwendin . Rêzgarke welat ji dijmin «Kes nayê bo te te serfirazkê ji hişê nezan

De were bixwîne ziman Ew nasnama te ye li cîhan Ji te werê pris tu kîye ey qehreman, tê bêje bi serbilindî ez kurdim agrim li jêr û jor xwedî floklor ji dor.... . Lê yek car heye bixwînin ziman.

### Tîpînî:

**Rojnameya Encûmen lêborînê ji mamoste mehmûd osê re dixwaze, ji bo şaşitiya bê mebest di jmara 7an de çêbû ku gotara wî ne bi weyneyê wî re daket.**

**Bibûre mamoste .**



Hemdiya Mele

Ma kî bê  
hêz welat  
bi rê ve  
birine ???


tê xwestin  
pirojeyên  
netewî amade  
bikin, simînaran  
li darxin û millet  
hişyar bikin

Hişyar Emerê Lalê

## Xewna me winda dibe

Lê Ma kî xwena me windadike ??? Ev pirsyar bersivek rast û durist jêre divê!!!!!! Hemî şîrîkê hevin Yek xerabiya dike Yê dî neraziye lê deynakê beyana dertêxê ....em vî karî şermezar dikin û riswadikin û.....û.... Ev gotin hemîjî firingek qul naynin ... zixurekî ji cihê wê nalivînin... Ti rondika ji çava jî naseknînin birînekî derman nakin nakewînin hevaleyê ji zindanê naderînin Rewşa millet naguhrînin Ti daxwaz û hêviyajî bi cînaynin Ma ev çiyê ????? Yekê bêjê da birakuji çênebe Yê dî wê bêjê em siyasetê dikin em ne çekdarin Gelo ma kî bê hêz welat avakirine ??? Ma kî bê hêz millet parastine ??? Ma kî bê hêz welat bi rê ve birine ??? Pirsyarin bersivê dixwazin ??? Yanî bêjin em nikarin tiştêkî bikin ??? .... lê ez şehdebûnê didim diçine ezaya û xwe dikin xwediyê ezayê lê li banî dirûnin Cih nadine mêvanên xwe jî ...û diçine dewetajî lê divê serê govendê bigrin ...em serê we na êşînin ev kar û xebat ti armanca pêknaynê ????????

Li gor guhertinên ku çêdibin li ser asta Rojhilata navîn û cîhanê, di van salê dawî de, ku şoreşa sûriyê alîkar bû, ku gelek plan û bercewendî bîn diyar kirin, gelo pirsê Kurdî li ser masên kiftûgoyê tê bi cî kirin yan na? Lê pirsê herî giring ewe ku ta çi radeyê, em kurd wek millet, siyasetmedar û rewşenbîr, amadene ji van guhertinan re. Ji kesên pispor, rewşenbîr û akadîmî, ku îro bi rêjeyek baş tî peyda kirin, tê xwestin pirojeyên netewî amade bikin, simînara li darxin û millet hişyar bikin û li gel kesên siyasetmedar hevdiîtinan pêkbînin, çimkî daxwaza netewî ji erkên wan e. pêşketina kesên pispor jî ji pêşketina bajar û xelkê herêmê ye lewma pêwîste bi yek deng, yek helwêst û yek armanç ê karbikin ji bo bi hêzkirina milletê kurd, ku bi kare li doza xwe xwedî derkeve û mafên xwe bi dest bixe. Diya Şiyar 15/09/2018



Dr. mûnîb Ehmed



## Serhildana Dêrsimê

Şoreşa Şêx Se'îdê pîran û Şoreşa Agirî û hewldanên gelê kurd li Bakurî Kurdistan ji bo bidestana mafên rewayî gelê kurd û bexşîna qurbanîyên giran ji bo vê dozê bû cîhê tirseke mezin ji hikûmeta Tûrk re li wê demê . devera Dêrsimê û derdora wê dihat naskirin bi kelha mêrxasan serhildan çend caran li wir rabûn, û çendî caran Dêrsim hatiye şewitandin ji aliyê dijminê gelê kurd ve . Dewleta Tirk di berdewamiya kiryarên xwe li dijî doza Kurdî Dêrsim xiste armanc, û di sala 1935an de zakonek derxist Ew ji koçkirina Kurdên devera Dêrsimê û bi Tirkirina wê deverê ji bo vê yekê dest bi şewtandina Gundên Kurdî kir û agir berda malê kurda her core kiriyar li dijî Dêrsimê bi kar anin di bersiva vê zilmê de di 10 Çillê paşîn 1937 de Tikoşer Seyid Riza bi serhildaneke mezin rabû girsiya serhildanê metirsiyeke mezin li cem Deshilata Turkî çê kir kû bû egera amadekirîna hêzeke mezin qewamê wê 25000 asker ji bo şikandîna Serhildana Dêrsimê herweha Firoke jî bi kar anin şoreşvavan her li ber xwe didan lê Artêşa Tûrk dest bi hovitiya xwe kir kû hertişt kir bo ev serhildan ne gihê armancê xwe li gor Atatûrk ke digot. : "Eger em vê Şoreşê bişkinin ,em karin bêjin me doza Kurdî di tirbeke kûr de veşart û me li ser bi Ismentê dagirt." Tê zanîn kû di dema berdewamiya Serhildanê de û erîşên Tirka e hovane li ser kesên sivîl di 15 10 1937 de Nameyek ji Aliyê Reberê Serhildana Dêrsimê Seyîd Riza bo Wezîrê derve e Ingilîz hate şandin ji bo rûnkirina rewşa deverê û zilm û zordariya Artêşa Tûrk bi ser kesên sivîl de , di namê de Seyîd Riza dawa parastina gelê xwe ji Cinosîde kiribû lê ev name eşkera nebû û bê encam bû û Cinosid hat kirin bitîr ji 50 hezar kurd hatin kûştin bi şewekî hovane kû tê naskirin bi Cinosîda Dêrsimê . Di 10 Eylûla 1937 de li Erzincanê Seyîd Riza hat girtin ji aliye Artêşa Tûrk ve û di 18 Ber çille yî 1937 de li gel Kûrê wî Reşik û birazayî wî û serokê hozan Yosef Qenber û Seyid Hussein û havalên wan hatin bi darvekirin kû bê dangiya civata navdewletî her wekû caran diyar bû , lê kesanê wekû tikoşer Seyid Riza her dê biminîn di hizr û bira gelê xwe de û gelê kurd her dê li peî doza xwe ya rewşa bin ew ji Kurdistaneke Azad e.



**Dr . Nûrî Dersimî**

1890-1973

**Qasim mer'îka**

**Melayê Cizîrî**

1570-1640

Li gundê Burnakê ya Ovacixê hatiye dinyayê. Ji Eşîra Mîlane. Piştî ku Ruştîyeya Leşkerî ya Elezîzê xwend, di sala 1911an de li Sultanehmenda Stenbolê dikeve dibistana Baytariyê. Hêj di dema dibistanê de, dikeve nava "Cemiyeta Muhîban ên Kurdistanê" ku li tenbolê Ava bûye û sekreteriya wê dike. Wekî baytar Eterîner) tayîna wî bo Erzînganê derdikeve. Gelek Caran diçe dêrsimê û bi serekên eşîran re dide û Distîne. Gelek girîngî dide yekîtî û zanyarîbûna Kurdan. Di vî warî de kedeke mezin dide. Beşdarî Tevgera gel a Qoçgiriya dibe. Ji bo bi hikûmetê Bide pejirandin, ji bo xwestekên Kurdan gelek Hewl dide. Ji ber vê yekê dewlet dixwaze wî ji Holê rake. Derbarê wî de cezayê îdamê tê dayîn. Li Axdatê ku Seîd Riza jî li wire, bi cih dibe û Xebatên xwe li wê derê berdewam dike. Dema ku Ji bo armancên Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê li Herêma xebatan berdewam dikir de tê girtin. Di Serî de Seîd Riza û Dêrsim li ser vê girtinê bertek (Reaksiyon) nîşan dide. Li ser van bertekan tê Berdan. Ji bo ku bûyerên li Dêrsimê diqewimin. Ji Tevahiya dinyayê re vebêje, ji hêla Seyid Riza ve Tê Peywirdarkirin û bo Sûriyê tê şandin. Qewimînên li Dêrsimê pêk tên, ji tevahiya Balyozxaneyan re wekî raport dinivîse û hewl dide Ku alîkariya derve werbigire. Li Sûriyê gavên Xwe ji jiyane re girtiye û gora wî li Efrînê ye. Dêrsimî wekî Baytar Nûrî jî tê naskirin. Bi navê "Kurdistan Tarîhînde Dêrsim" (Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim) û "Hatîratım" (Bîranîn ên Mîn) du pirtûkên wî hene. Her du kitêb jî ji bo lêkolînerên Kurd. du her ne.....

Li Cizîrê hatiye dinyayê, bavê wî alimekî Navdar yê bi navê Şêx Mihemed e. Endamekî eşîra Bextiyarî ye. Perwerdehiya Xwe ya destpêkê ji bavê xwe wergirt. Navê Wî yê rastin, Şêx Ehmede. Paşê ji Mele Taha Ku ji gundê Sitrabaşê ye, perwerdehî dît. Gava ku perwerdehiya xwe temam kir, li gundê Sirbayê melatî kir. Paşê li medreseya Heskîfê dersdarî kir. Piştî kurtedemek vegeriya Cizîrê û li "Mizgefta Sor" ders da. Heta mirina xwe li wir ma. Bi hezaran şagirt Perwerde kir. Qet nezewicî û karîn û şiyana Xwe bo şagirtên xwe û perwerdehiya wan Serifand. Tirba wî li bin mizgefta Sore. Ew Ber ji hêla Kurdan ve wekî cihekî pîroz tê Hesibandin û iyaretkirin. "Dîwan" a wî ya ku Heta roja me hatiye, yek ji berhemên hêja Yên edebiyata nivîskî ya Kurda ne.





## *Roja jinê*

### **Roja nav dewletî ya tûnd û tûjiya dijî jinê**

Roja 25 ê meha 11an Rojêke navdewletî ye ji bo tûnd û tûjiya li ser jinê ya ku Berdewamiya wê 16 Rojên oranjî ne di vê Helkeftinê de rêxistina jina kurdî ya azad Bi ampaniyekê rabûn bi navê na ji bo bê Dengiyê ..ti ji wilo xortirî di vê derbarê de Cîgera berpirsiyara rêxistinê Çinar Hîndo Ji mere daxwiyânî û got em di hundirê Kampaniya xwede karê ko em roja pêşî Em pê rabûn me rûpelên kaxezan li Dîwara xistin û li ser rûpelên kaxeze Wêneyên jinên ko tûndî li ser wan hatibû Kirin me danîbû û li bin wêneyan hatibû Xwiyânî jin dayike û xwişke û qîze û Kevaniye Di gel vê kampaniya mede Seknek me jî hebû jibo tûndiya li ser jinê û ji bo roja avdewletiya ji bo hilanîna Tûnd û tûjiya li ser jinê û 16 rojê oranjî Me terîşên burtiqalî li ser sîngên jinan Xistin û wan pê xemilandin û hîn jî Kampaniya me berdewame di gel çalakiyan di rojên bê de Û her û her em Dengê xwe bilind di kin û di bêjin Na bo Tûnd û tûjiya li ser jinê .

Li bin konê pêşwaziya Ebdirruhman Apo.

Hevpeyvîn bi Mamoste Ebdirruhman Apo re. bi dengê tomarkirî

Hatiye nivîsandin

Ebdirruhman Apo:

Bi rastî dibêjim ez wek kesekî girtî Ji 12ê maha-7-sala 2017 Heta roja îro Bûye salek û çar heyv Ez dibînim Gelekî dirêj e Lê birastî ji ber xetê Berzaniyetê û xetê kurdiyetê û ji ber Xetê doza kurdî ez dibêjm ne dirêj e.ji ber ku me dizanî karê me çî bû û wan ji bo çî Em girtin û me zanîbû jib o çî em hatine girtin ango ez Gelekî bi sîngeke fîreh û aramî diçim Meselê û ez işkince dikirimmin Dizanîbû wê rojekê bê min berdim û Xwediyê min hene û hevalên min jî Hene û bi rastî zindan tecrîbeye û me xurt dike.



Menal Hesko

## Ferhad Şêxo:

Berpirsiya yasayî û siyasî û rewîştî dikeve li ser milê PYD ê. Menal Hesko: Nivîskar û şîrovekarê sîyasî li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê hatiye zayinê û li Swêdê rûniştiye. Rojnameya Encûmen vê hevpeyvînê ligel şîrovekarê siyasî Menal Hesko pêk anî li ser rewşa dawî ya li herêmê derbas dibe : -Tu çawa daxuyaniya dawî ya danûstandinên Esîtana dinirxînî?. -bi rastî, Ez nikarim navê wê bikim kongir , bi taybet

dema dewletek bi giranbûna Rûsyayê amede dibe ji ber ku daxuyanî bi her 14 xalên xwe nagihe qebara berpirsiyê û xopana li ser xaka Sûriyê çêbû ye , ji ber ku ezmûnan me fêkirine wek nimûne : peymanî Kamp Dêvid û Oslo ku aliyên van peymanan li hev kiribûn berî bigihêjin û derbasî hola kongir bibin. Di vî warî de, hemî kongir di despêka şerê Sûriyê de ta îro, hemî diyarkirin e û hemî alî tiştên li çem xwe li gorî berjewendiyên xwe diyar dikin li ser berdewamiya xwînê, û xala herî diyarkirî ew naskirina dîroka civata bê di taliya meha sibatê di 2019an de. - Emerîka xalên çavdêriyê li rojhilatê robarê Firatê avadike, win çawa vî karî dibînin, nexasim ku Tirkiyeyê hewl dike ku rojhilatê robarê Firatê dagîr bike?. -Her kes dizane ku Emerîka ne kompaniyeke ewlehiyê ye, ji ber ku ew dewleteke zihêz e e û berjewendiyên wê tê di pêşiya siyaseta wê de ye , û çêkirina van xalên 14 ev destnîşaneke diyar kiriye ku em li vir in û ev devera berjewendiyên me ne û em nahêlin tu kes nêzîkî wê bibe yan hewl bikin ku berjewendiyên me dûr bikin di pêşerojê de, û Tirkiyayê jî dixwest û min jî hêvî dikir ku Tirkiye bikeve wê şaşîtiyê û derbasî hin deverên din bibe û bi taybetî piştî dagirkirina wê ji Efrînê re ji ber ku li dûmahiyê de wê bibe tawanek li ser milê wê, belkî dagirkirina deveran hêsanî ye lê baca derketinê gelekî giran e li ser dewleta dagirker ( Tirkiyayê). -Çi ji Encûmena Kurdî û PYD tê xwestin ku metirsiya êrîşên Tirkiyeyê bisekinin?. -ez matmayî dimênim bi mixabiniyê ku ev pirsyar tê kirin ji ber ku hûn ( Encûman) in we ew û PYDê xist e nav yek alî de, derbarê rakirina giraniyan û em dizanin ku Encûman qurbaniya yekemîn bû ji dagirkeriya Qendîlê bi darê PYD ê . Ji ber vê hizrî ez wan naxim nav bersiva vê pirsê de, jiber ku berpirsiya yasayî û Siyasî û rewîştî dikeve li ser yê digot ez desthilat im, û divê ku ew encam rake û li hilbigre , û ez bi hêvî me ku Encûman beşdarî şaşîtiya wan nebe, nexasim ku PYD Kobanê xirakirin û ew sedem bûn ku Efrîn hat dagirkirin û miletê kurd koçber kirin ji tevahiya Cugrafiya Rojavayê Kurdistanê. Herwisa Encûmana Kurdî helwesta wê ji destpêkê de diyar bû ji hemîyan re , nexasim ku ew bi yekrêziya mala kurdî re bûn, û alîkar bûn di nav çarçoveyê siyasî giştî û ev yek di peymanî Hewlê û Duhokê hatibû li hev kirin, herwiha siyaseta Encûmanê jî ya li dijî dewletên ku perçeyên Kurdistanê dagîr kirine diyarkirî ye. Lewma ewê ku xwe kirin berpirs û rayedarên stûyê miletê kurd divê ku ew barê encamê rake , û di heman demê de nabe ku Encûman wan rizgar bike û zagoniyê bide wan .



Dilovan çeto

## Sê bêjeyên bi seyr te kêfxweş dikin

Bê guman xwedanê mezin dema insan afirand,gelek ji pesindanên xwe tevî vî insanî kirin loma pêwiste insan jî di jiyana xwede mirovekî dilovan û dilsoz be,dil paqij û xwedî rewîstekî bilind be. Jiber wilo jî tiştêkî xerab û reftarên neyênî piştî jiyana ligel civakê têne wergirtin,û nabe tukes gunehê van tiştên

xerab têxe stiwê tukesî, jiber her mirovek berpirsyare diber wergirtina reftarên erênî û neyênî jî. Zanista nûjen tekez dike ku her serê 11 mehan mirov ji nûve tê afirandin û her kesayetek berpirsyare piştî 11 mehan xwe nû bike yanjî wekî xwe bimîne. Ligorî pîvanên navbûrî mirov dikare du girûpên reftaran destnîşan bike: -\Tendirustî , heskirin û xêrxwazî -\Nexweşî,zikreşî,kerb û nexêrxwazî

Girûpa yekemîn dihêle mirov kêfxweş û dilşad be,li tersî girûpa diwemîn ku dihêle mirov xemgîn û dil êş be. Çareya herî guncaw ewe ku mirov xwe ji girûpa diwemîn bi parêze û sûdê ji girûpa yekem bigre û ewjî di riya sê bêjeyên bi seyr têne bi kar anîn. Lêborîn-Heskirin-Dan Ev hersê bêje bihevre girêdayî ne bişeweyekî ku yek bêyî bêjeya din nikare dûrî hevalên xwe wê bandorê li mirovan bike û ev zincîr alîkariya mirovan dike ku di riya cîbicîkirina van bêjeyan re sûdeke pir mezin jê digre. LÊBORÎN Yekem bêjeya biseyr lêborîne, ku ew bixwe dibe bingeha herdû bêjeyên din û bihevre kêfxweşiyê ava dikin.

Lêborîn bixwe eger em wê bidine nasîn,bê çawa kumpyûter yanjî mobaylek dema tije vîros dibe, di riya Formatê re tê paqij kirin,wilo jî bê çawa di jiyana rojane de gelek reftar û serederiyên şaş û ne dirust di mejiyê hundirîn yê mirov de cih digrin,rê liber g elek reftarên baş û pak digre û dibe sedema ku endamên gewdê mirov bi rolên xwe yên xwezayî ranabin,loma pêwistiya wan bi paqijkirinê heye û formatkirina mejî bi lêborînê dirust dibe. Di encamê de tê xuyanîkirin ku lêborîn bingeha kêfxweşiyê ye û sedema sereke ye ku berê mirov dikeve heskirinê,çimkî dil valaye ji her tiştên neyênî û tenê tiştên xweş û geş cihê xwe di dil de digrin û ev yek di hêle ku dil amade be pêşwaziya heskirinê bike. HESKIRIN Heskirin jî bêjeya diwemîne ji zincîra bêjeyên biseyre ku dibe girêdanek dinav bera herdû xuşkên xwede û tevî ku cihê wê di zincîrê de di pileya diwemîn deye,lê bêjeya herî bihêze û bandora wê li herdû bêjeyên din heye.Liser heskirinê têtikilyên dinavber civakê û kesayetan de têne girêdan û dema ku navê heskirinê tê gotin,(dayik,bav,kur,keç û yar ) herweha (siruşt,gul û kulîlk,buhar û çivîk) libîra mirov tên. Bê guman heskirin jêdereke bingihîne ji enerjîyê û bihêzkirina hemû endamên gewdê mirovan ku ewjî sedemeke bingihîne ji ber dewamiya jiyaneke xweş bê êş û azar ku yekrast berê mirov dide danê. Dan Dan jî encameke xuristiye ji ked û karê herdû bêjeyên pêşî re,(lêborîn û heskirin.( Eger ne ji heskirinê be ku ewqas hêz bixwere tîne tu wate ji danê re namîne,çimkî mirovên ku lêborîn û heskirin licem wan hebe ,dilê wan dikare danê jî bike û wisa bê çawa herkes xêrxwaziyê ji xwere dixwaze wilojî ji herkesî re dixwaze.



Gora Selahedîn ji aliyê hundir



Diravekî selahedîn



Weyneyê selahedîn



Gora Selahedîn li Şamê

## Selahedînê Eyûbî kî ye û çî kiriye

Sultan Selahedîn, di sala 1138'an de li Tikrîtê hatiye dinê<sup>[cavkanî pêwîst e]</sup>. Navê wî ye zayînê "Yûsiv" an "Ûsiv" bû û li gorî gotinan navê *Selahedîn* pê re ji hêla Nûredînê Zengî hatibû dane wî. Navê bavê wî Necmedîn Eyûbê kurê Şadiyê kurê Merwan<sup>[5]</sup> bûye. Malbata wî bi eslê xwe ji eşîreta Rewadî bûye û Rewadî jî digihîjtine Hezbaniyan ye.<sup>[6]</sup> Kalê Selahedîn, Şadî, di dorê salên 1130an de ji Dvînê, ji pê xanedaniya Sedadîyan hilweşiya re, siftê çûbû Bexdayê, pê re jî hatibû Tikrîtê. Li Tikrîtê Bîhrûz, emîrê wê herêmê, Şadî dike emîrê Tikrîtê. Pê bavê Necmedîn wefat dike re ew derbaza şûna wî dibe. Lê wextê ku Şêrko, apê Selahedîn, li wir bi xristiyanekî ve li hev dixin û Şêrko wî dike re malbata Şadiyan tê sirgûn kirin. Gorî rivayetan Ûsiv, ango Selahedîn jî di vê şevê de tê dinê<sup>[7]</sup>. Wê çaxê Necmedîn û Şêrko diherine cem Îmadedînê Zengî. Di 1132'an de wextê ku Zengî, bavê Nûredînê Zengî, nêzî Tikrîtê bi el-Musterşid re cengekê dike û Zengî dikeve zorê bavê Selahedîn, Necmedînê Eyûbî, Zengî ji wa halê zor de difilitîne û pê wê ve Zengî deyndarê Necmedîn dimê. Wextê ku Eyûbî tene cem Zengî, Zengî jî wan li cem xwe erkdar dike û wextê ku di sala 1140'î de Belbekê zeft dike Eyûb dike emîrê Belbekê. Bavî Ûsiv heta sala 1146'an Zengî wefat dike û lawî xwe Nûredîn derbaza şûna wî dibe, li Balbêkê dewama emirîtiyê dike û wextê ku di wê salê de Muînedîn Nûr, emîrê Şamê, Balbêkê dorpeç dike Necmedîn bêçare bajêr teslîma wî dike û Necmedîn ji xizmetê Nûredîn derdikeve û malbatê xwe radike û dihere Şamê. Wextê Sefera Xaçiyayê duyem de di parastinê dorpeçê bajarê Şamê de bavê Selahedîn, Necmedîn jî pardar dibe. Derheqê biçûktiya Ûsiv de zêde tişt nêye zanîn. Salên xweyên siftê li Balbêkê derbaz dibin, li wir det bi perwerdeyiya xwe dike, lê pê ku bavî xwe dev ji emîrîtiyê berdide û bi malbata xwe ve koça Şamê dike Ûsiv li wir dewama perwerdiya xwe dike. Wextê ku di sala 1154'an de Nûredîn bi serkeftî, hema bêketina tu cengan, Şamê destxwe dixwe. Di vê serfiraziyê de faydeyê Şêrko û Nûredîn jî pir lê dibe û Nûredîn bavî Ûsiv dike waliyê xweyê Şamê. Şêrko jî di wê wextê de qumandarê Nûredînê herî girîng bû.




Luqman Silêman

## *Şemdîn û Hemdîn xeleka (7)*

Nebilîne hîn tu xortî cahilî aqilê te nîne zilamê birayê xwe bikuje Ez di tirsim derbekî li texê tejî bi kujê berxê bavê min o ma tu ji min pepûka xwedê re nabêjê namûs û xîret girana ma tê min ji kîjan kopelê mêrê xelkêre li ber dîwara bê tar û tur bihêlê berxê min o ho hohoh hey ho lawo min o axa yê min o barxê bavê min o. Hê axa yê min o dîsanê dema ku xulamê çûyîn pey Hemdîn o û Mencê xatûn ê ew razîkrin û bi çepelê wan girtin berê wa dane

oda apê wî Ehmed axa yê delo dîn. Dema ku Hemdîn û diya xwe çûne odê rê û rêwanî di odê nebû bi derbasbûna wan re tev di ber wan de rabûn. Wek pêla deriya li wê odê ket tev di ber wan de rabûn Ehmed axa bakire xwe were lawê min o li kêleka min rûne were biraziyê min were berxê bavê min were li kêleka apê xwe rûne were lawê min hêhê.. hêhê Begê min o dilê min dilekî delo dîne Ehmed axa ji Hemdîn re dibêjê were li kêleka apê xwe rûne lê Hemdîn ne çê cem apê xwe. Hê hê Begê min o dema ku Hemdîn di deriyê odê de û apê wî jêre got were li kêleka apê xwe rûne lê Hemdîn wî xweşmêrî bersiva apê xwe ne û di derê odê de li nav şekala wî û diya xwe çokê xwe berdana erdê. Ehmed axa bakire Hemdîn lawê min o tu ne bi qasî min ber bavê xwe ketî ez birayê wî me tu kurê wî lê bihna xwe fere bike xwedê mezine heger ku xwedê rihê min ne stîne ez heyfa bavê te li erdê nahêlim. Berxê bavê min o tim û tim xelkê hevdû kuştîyê û heyfa wan di zikê hevdeye lê ez apê teme ezê li pêşiya çavê te heyfa bavê te hilînim xema nexwe berxê bavê min o. dema ku Hemdîn va gotina ji apê xwe di bihîzê çavê wî sorbûne weka di fincanê xwînê aqil di sere wî de namîne di bin cava re li apê xwe di meyzîne û diya xwe di niqurçîne û badikê apê xwe jêre dibêjê apo dilê min dilekî delo dîne te birayê xwe Hisên axa yê delo dîn dîtibû ez bi xwe lawê wî me soz û qerarê xwedê çiqas ez didim aqilê xwe ne bêjê Hemdîno bê aqile tiştêkî fêmnakê ez çiqasî didim aqilê xwe kes qesasê bavê min nîn e ji nefsa cane te pêve gerek ez fincanek ji xwîna te vexum belkî sekeriha nava min bişkîne apo xayîno lolo.. Lolol axa yê min o dilê min dilekî dilo dîne Ehmed axa ji biraziyê xwe re dibêjê emiro quto tu va gotina dibêjê bi sê qesem nave xwedê heger tu ne di nav vê alemêdeba mine serê te weka yê kûçîkekî jê bikira û li pey bavê te bavêta derahanê. Hemdîn li apê xwe vegernad go apo wê roja ku Sîmail axa û bîst û pênc axa yê Zozanê jorî hatin oda te hatin oda bavê min xwestin we berdîn hev û fesadiya te li ber bavê min kirin lê bavê min ji odê berda wan û gotinê wan ne xistin sere xwe. Piştî ku bavê min ji odê berda wan ji nûve berê xwe dane oda te û gelacî li ber te kirin û ji tere gotin em axatiya bavê Hemdîn li ser xwe qebûl nakin lê te ji wan bawer kir û te xiste serê xwe û ev derba bê îman li bavê min xist ma te çî heq li me hebû te çira bavê min tefan ji darê.




## ji Foloklorê Kurdî

### Serpêhatiya kurê mîr ...xeleka (3)

Ev çend sal in em bi hev re dijîn û hertim tu li ser çelengî û mêrxasiya xwe dipeyive, ez dixwazim rojekê vê lehengîya te bi çavê serê xwe bibînim. Mîr ji van gotina serxweş bû û xwînê xwe ajote damarê wî, bi tinazî li jina xwe veğerand: - ez amede me, ka tu çi dixwazî ? - ez dixwazim herdû tiliyên destê te bi hev

ve girê bidim bi mûyê dûvê hespa û ez bib înim tê çawa karibî xwe azad bikî. - Mi peşirand, ji te herdû tiliyên min , bi hev ve girêde û tê ji xwe re bibîne bê çi hêz li ser mine lêê. Wek mêrê ji xwe behwer destê xwe bi alî jina xwe de dirêj kirin, jinê herdû tiliyên mezin bi mû bi hev ve girêdan, mîr dest bi hewildanên xwe kir, da ku mûyê zirav biqetîne, lê wî çiqas zor û hêz dida xwe wilo jî mû goştê wî didirand û qelaşt, tê de çû xwar ta hestû, bû nal nal û gazî, mîr hîn di wê berxwedanê de, wan siwarên xwe veşartibûn ta derb li mîr anîn hinga xwe avêtin ser û ji dest û lingan ew girêdan, avêtin odeyek reş û tarî, zarok jî avêtin ser çavên wî, dergeh li wan qapat kirin, mîr xwe dît dîl û di rewşek lawaz de, keys jê hat sitandin, jinê dekek lê kir. Di şevtariyê de û dest girêdayî wê çi karibe ji nû ve li ber xwe bide ? bîra mirina xwe dibir lê bîra rojek wek îro ne dibir, çawa ketiye xefka jina xwe, a ku ew ser destê xwe xwedî kir, bi şîrê xezala mezin kir û bi zanebûna xwe perwerde kir. Serê wî tewand û ew kire vê rewşa xirab ku xwedê neyne serê tu kurê camêra. Gazî keça xwe a mezin kir lê wê xwe ne livand û ti arîkarî pê re nekir, bi palmisandinê dest palandin, da qetek kêr, guzanek an şûrek têkeve destê wî, ji bo bena pê biqetîne, çaxê destê xwe veke ew kare dergeh jî bişkîne, hinga wê karibe tola xwe ji jinê û wan bêbavan hilîne, mîr ma di wê kefteleftê de ramanek wî dibe û yek din wî tîne, cira bi serî hatiye mîna xewnekê ye, hema tiştê rind hîn ew nekuştibûn, qey ew ji rojek din re hiştine. Lê bû berê sibê û berbangê veda, hedana mîr nehat , nejî çavên wî çûn serhev , namûsa wî ketiye bin lingê sega û biyaniya, di dawî de lave ji lawikê biçûk kir, dema lawik bav dît di wê rewşê de, xwîna lawik kelî li ser bavê dîl, temenê lawik wilo biçûk lê wek şepalekî rabû ser xwe, dixwest karekî bike, da bavê xwe azad bike. Geriya negeriya tu tişt di dest neket, carekê ji nişka ve û bi hêrs dev li wa ben û tayê di dest û lingê bavê de kir, bi dinanên xwe ên hûr wek ên mişk, piço piço ew ben ji hev veçirandin û qetandin, bavê xwe azad kir, Mîr wek şêrkî birîndar û birîna wî hîn germ, agir û birûsk ji navbera herdû çavên wî diçirkiya, mîrê kurd çaxê xwe dît dest vekirî, bi yek kulmê re dergeh ji ber kir, hîn neyarên wî di mala wî de bûn, bi jina wî re di nav xwarinê û vexwarinê de serxweş û sermest bûbûn, rahişte şûrekî û derî li wan vekir, çaxê çav lê ketin desthelatin ji wan çû, ji mêranî ketin, çavên wan di nîva serî de rawestiyan wek mirovên lal nedengkirî man. Mîr bê dilovanî ket nav wan, di serî de jin kuşt û di pey re neyarê xwe yeko yeko gurandin, li zaroka nehêrî, çavên wî nema bi wan barbû di dilê xwe de got “win jî ji wê dêlikêne”, şûr avête sitûyê keça mezin, ew jî gurand, di pey re ên din lê ji bilî kurê biçûk, tev bi ser hev de kelax kirin, lawikê biçûk avête ser piştê hespê, dev ji wê burca belek berda, wî milk û mewdanî, siparte wan kelaxên mirî, li pişt xwe hiştin û berê xwe da cîkî nediyar.



## XÎYANET TE NAKE RÊBER

.....  
Bi çend gotinên felsefe û tok  
Tu nabê rêber , û ne jî serok

Te hêlîna xwe li şamê çêkir  
Li peyvên bav û kala te nekir

Kî ji we herê, hembêza dijmin  
Ew ne kurê min, û ne jî ji min

Li wan erzane namûs û rûmet  
Nakin ji bona kurda , qet xîret

Tu ne li male , û ne jî li kar  
Hevsar girtî li ber qesra mar

Yek tişrîne, û ya din li tehran  
Li welat bûye wêran û talan

Xulamî te nake beg, ber derî  
Qedrête eve li welat, ezbenî

Birin ji te zêr û tac û sera.....  
Dan pêşa te kah û kês wek kera  
Gelek rêber li cîhanê hebûn.....  
Kurd man bê xudan û eywan li şûn

Xandî li hindê, anî serxwebûn .  
Kurd jî bi top û tiveng çênebûn .

Bavil û e'vdel, derdê şêxê şil  
Kêr di pişta me dan,şikandin mil

Hîro û berham û mala sişwar  
Kerkûk û şingal, kirin neyar .

Wekî harbak gotin em serokin  
Dilê evîna min ..... dan firotin

Li alî din ..... kobanê û Efrîn  
Çekdar lê neman tev da revîn

Li her deverê heye yek Rêber  
Di nav meda sed û çar Sikreter

Loma em tenê xwe man bin dest  
Ji hişên mirdar , ji hişên seqet

Li ser daniştê mane şêst yek sal  
Huner û Ken , heft Kiras û şekal

Nema sebir û aram li kurdan  
Mirûd û peyatî hûn li paş man

Dê werin tev li ser şopa sîper  
Ew dimîne nîşana ala ser

Bi azadî maye li ban û can  
Diçe li seranserî Kurdistan

Hêlîna xwe çêkir li çar çira  
Emanet da destê lawê merda

Îro li hewlêr serxwebûn pêkhat  
Tev pêşmergên zîrevan bi xebat

Yek ale rengê kesk û sor û zer  
Bîst û yek kezî li roj hatî der .

Mahmod Oso

Sîper



**Sîmav Efrînî**



**Konê Reş**

Qenc dizanim ku tu·  
Ne Kurkekî li xwekirinê ye  
Ne jî· hozeke pesnandinê ye

Tu her tiştî ;  
Tu qedera minî  
Ez qedera te me  
Bi kûve bi revim  
Ezê li te rast bêm  
Tu bi kûve herî  
Tê li min rast bê  
Tu starên min nîn in  
Ji siha asmanê te pêve  
Tu demên minî xweşnîn in  
Ji buharên zozanaên te pêve  
Siha asmanê te  
Buharên zozanê te  
Yên min in  
Wek ku yê her Kurdekî  
Dilsoz û xemxurin...

Piçekî ji te hezkir  
Bi navê xuda ...  
Yê li Ezmana  
Min gelek hez te nekir !!  
Tenê piçekî .. ji te hezkir !!  
Ew pir hindik bû .....  
Hezkirina Min ji bo te  
Ji hindiktirînê bi hindiktirîn bû  
?!???!!!  
Lê Ew hindiktirîna ji meznahiya  
cîhanê mezintirîn bû  
Ji dilê xwedê feretirîn bû .....!!  
Tenê Ew piçek bû